NSW Health

# Lênihêrîna nîgaşî li NSW

## Virtual care in NSW

Kurdish Kurmanji

## Lênihêrîna nîgaşî çi ye?

Lênihêrîna nîgaşî (Virtual care), carinan jê re lênêrîna rwndurûstî ji dûr ve (telehealth) tê gotin, gelek awayên ku hûn nikarin lênihêrîna rû bi rû peydakirin bikin. Di nav de:

- civînên li ser înternêtê
- telîfon
- ji bo çavdêrî kirin û rêvebirina tenduristîya we ya li malê bi kar anîna cîhazan.

Dibe ku we ev jixwe bi kar anîbe, wekî ku ji GP ya xwe reçeteyeke dubare bistînin an jî encamên testê nîqaş bikin. Mînakên din rehabilitasyona nîgaşî û bikaranîna cîhazên ji bo şopandina tendurustîya we ya li malê.

Lênihêrîna nîgaşî, lênihêrîna rû bi rû naguherîne, lê zêde dike. Wexta ku li we bihê, hûn dê hê jî xwedîyê biryarên xwegihandina lênihêrînê bin.

Hûn û bijîşkê we dikarin bi hev re biryarê bidin bê ka lênêrîna nîgaşî ji bo we guncaw e yan na.

## Feydeyên lênihêrîna nîgaşî çi ne?

Lênihêrîna nîgaşî, ji bo ku hûn çawa xwe bigihînin xizmeta tendûristî zêdetir vebijêrkan dide we. Di heman demê de dikare ji bo we hêsantir bibe ku hûn lênihêrînê bistînin.

Gelek feydeyên wergirtina lênihêrîna nîgaşî hene. Hun dikarin:

- lênihêrîna gihîştinê ji malê an nêzîkê malê
- dema rêwîtiyê û lêçûnan kêm bike, ku ji bo wextê bêtir bidin tiştên ji bo we girîng in
- di randevûyên we de endamên malbatê, karwanan an jî peywirdarên din ên tenduristiyê hene, li ku derê bin bila bibin
- pêwendîyê bi servîsên taybetî yên ku wergêr jî di nav de, dibe ku li devera we ya herêmî ne guncaw be. Wek mînak, heger hûn li gundekî dijîn, hûn dikarin bi pisporên li bajêr re têkiliyê deynin.

Lênihêrîna nîgaşî we bi lênêrîna rast ve girê dide, kengî û li ku derê pêdivîya we pê heye.

## Çawa dixebite?

Randevûyên lênihêrîna nîgaşî randevûyên ji rêzê ne-cudahîya sereke ew e ku hûn bi bijîşkê xwe re bi telîfonê an jî li ser ekranê diaxivin.

Lênihêrîna nîgaşî, ji bo telîfonkirin an jî bi vîdeoyên ku hûn bi kar tînin re heman teknolojîyê bi kar tîne ku hûn dikarin bi hevalên xwe û malbata xwe re bigerin.

Berîya randevûya lênihêrîna nîgaşî, dê di derbarê çawaniya girêdanê, hêvîya çi û çawaniya wergirtina alîkarîyê da agahî ji we re bê dayîn.

Wergêr ji bo randevûyên lênihêrîna nîgaşî hene. Ji bijîşkê xwe agahîyên zêdetir bixwazin.

## Pêdivîya min bi kîjan amûran heye?

Ji bo gelek randevûyan pêdivîya we tenê bi têlîfonekê, kompîtur, tablet an jî iPad'ê û girêdaneka pêbawer a înternetê heye.


Heger xwegihandina we ya van tune be, hûn dikarin ji bijîşkê xwe rêyên alternatîf bipirsin ji bo ku hûn tevlî randevûya xwe bibin.

Amûrên taybet ên wekî cîhazên şopandinê dê ji we re bên peydakirin.

Hin randevûyên lênihêrîna nîgaşî dê hin daneyên we yên înternetê bi kar bînin. Ji bo nimûne, telefona vîdyoyê ya 15 deqeyan dê nêzîkî 80MB daneyên we bikar bînin. Bikaranîna daneyan girêdayî telefona we ya mobîl an jî sererastkirinên înterneta malê ye.

## Lênihêrîna nîgaşî ewle û taybet e?

Erê. Lênihêrîna nîgaşî xwedîyê heman pîvanên ewlehîyê, nepenî û ewlehîyê ye ku lênihêrîna rû bi rû ye. Pergalên ku em di Tenduristîya NSW'ê de bi kar tînin, ji bo ku ewle bin hatine ceribandin.



"Lênihêrîna nîgaşî tê wateya ku zarokê min dikare lênêrînê di malê de bibe"

## Agahiyên berfirehtir

Ji bo agahîyên zêdetir li ser lênihêrîna nîgaşî serdana malpera NSW Health bikin: www.health.nsw.gov.au/virtualcare

Ji bo banga piştgirîya zimanan Servîsa Wergerandinê ya devkî û nivîskî: 131 450